e-ISSN:3023-5987

Bulanık MYO Sosyal Bilimler Dergisi

*Derleme Makalesi ● Review Article*

# Şîretên Jîyanê ji Dîwana Rezê Jîyanê *

# Rezê Jîyanê Dîvanı'ndan Yaşama Dair Öğütler

## *Advices on Life from the Divan of Rezê Jîyanê*

Şeyhmus ORKİN (1),

**KÜRTÇE**

Di vê xebatê de Dîwana Rezê Jîyanê ya Mela Eladînê Kopî, ji alîyê naverokê ve di warê pend û şîretan de hatîye tehlîl kirin. Mela Eladîn ku yek ji helbestvanên edebîyata klasîk ên îroyîn e berhema xwe bi wezna erûzê nivîsîye û Dîwana wî ya Rezê Jîyanê bi tevahî ji sê beşan pêk tê. Dema ku meriv bala xwe bide helbestên wî meriv dibîne ku di piranîya helbestên wî de mijara pend û şîretê bala meriv dikêşe. Ev xebat bi berhema Rezê Jîyanê ve sînordar e ku di vê berhemê de her beyt û misre'ek ku tê de şîret hebe hatîye vekolîn, di bin şeş serenavan de hatîye tesnîf kirin û li gorî naverokê hatîye tehlîl kirin. Di vê serdema me de berhemên Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û gelek helbestvanên din ji alîyê vekolîneran ve hatine vekolîn û tehlîl kirin. Lê belê berhemên van helbestvanên ku niha bi terza klasîk helbestvanî dikin û berdewamîya wan şairên mezin têne hesibandin bi têra xwe nehatine vekolîn û tehlîl kirin. Ji ber vê yekê her xebatek di derbarê van şairan de pir muhim e û ji bo xebatên qada edebîyata klasîk a Kurdî kêmasîyan diqedîne. Di encama vê vekolînê de hate dîtin ku Mela Eladînê Kopî di berhema xwe ya bi navê Rezê Jîyanê de hem di derbarê jîyana rojane de hem jî di derbarê heqîqet û hikmetên gelek mijaran de şîretan bi zimanekî sade û menzûm bilêv kirîye. Digel şîretên ku bi formek erênî hatine gotin dîsa di çarçoveya şîretan de gelek hişyarî jî daye xwendevanan ku ev hişyarî ji ber tecrube û zanîna wî ya 'ilmî tên.

**Anahtar Kelimeler:** *Kop, Mela Eladîn, Dîwan, Rezê Jîyanê, Şîret.*

**ABSTRACT**

In this study, the Divan named Rezê Jiyanê of the Kurdish poet Mela Eladînê Kopî, who was born in 1937 in Gündüzü village of Bulanık district of Muş, was analyzed in terms of the advices it contained. The work of Mela Eladînê Kopî, one of the heirs of the poets who prefers to write poetry in the classical literary style, has been written in the aruz meter and consists of three parts. When his poems in the mentioned work are examined, it is easiy recognized that he wants to convey advice and counsel to the readers in almost every poem. In this study, only the advices found in the poet's Divan named Rezê Jiyanê were classified under relevant headings and examined in terms of content with the text analysis and analysis method. The works of Molla Cizîrî, Feqiyê Teyran and many other classical Kurdish poets have been analyzed from different aspects up to now, but since there aren't sufficient analysis and comparison of the works of the poets who continue this tradition, the research conducted in this field is important and attempts to eliminate the deficiencies in the field of Kurdish studies. As a result of the survey, it has been determined that Mela Eladînê Kopî, in his Divan named Rezê Jiyanê, expressed his advice in many different areas that can be described as both daily life and the purpose and truth of life in a poetic way and warned the reader about different subjects based on both his readings and life experiences.

**Anahtar Kelimeler:** *Kop, Mela Eladîn, Dîvan, Rezê Jîyanê, Advice*

**ÖZET**

Bu çalışmada 1937 yılında Muş'un Bulanık ilçesine bağlı Gündüzü köyünde doğmuş olan Kürt Şair Molla Alâeddîn-i Kopî'nin Rezê Jîyanê adlı Dîvânı, içerdiği öğütler yönüyle tahlil edilmiştir. Klasik edebiyat tarzında şiir yazan şairlerin günümüzde yaşayan mirasçılarından biri olan Molla Alâeddîn-i Kopî'nin eseri aruz vezniyle kaleme alınmış ve üç bölümden oluşmaktadır. Şairin söz konusu eserindeki şiirleri incelendiğinde neredeyse her bir şiirde okurlara öğüt ve nasihatler ulaştırmak istediği dikkat çekmiştir. Bu çalışmada şairin sadece Rezê Jîyanê adlı Dîvânı'nda bulunan öğütler ilgili başlıklar altında tasnif edilerek içerik açısından metin tahlil ve analiz metoduyla incelenmiştir. Molla Cizîrî, Feqiyê Teyran ve daha birçok klasik Kürt şairinin eserleri günümüzde farklı yönleriyle tahlil edilmiştir fakat bu geleneği şimdi devam ettiren şairlerin eserleri üzerinde yeterli düzeyde tahlil ve karşılaştırma yapılmadığından bu alanla ilgili yapılan araştırmalar önemlidir ve alan ile ilgili eksiklikleri gidermektedir. Yapılan inceleme neticesinde Molla Alâeddîn-i Kopî'nin Rezê Jîyanê adlı Dîvânı'nda hem gündelik yaşam hem hayatın maksadı ve hakikati olarak tarif edilebilecek birçok faklı alanda öğütlerini manzum bir şekilde beyan ettiği ve hem okumalarından hem de hayat tecrübelerinden hareketle farklı konularla ilgili okuyucuyu uyardığı da tespit edilmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** *Kop, Mela Eladîn, Dîvan, Rezê Jîyanê, Öğüt*

*Bu çalışma, 16 Eylül 2024 tarihinde Muş'un Bulanık ilçesinde gerçekleştirilen Bulanık Sempozyumunda özet bildiri olarak sunulmuştur.

[1] ***Dr. Öğr. Üyesi,*** *Muş Alparslan Üniversitesi, Fen Edebiyat Fakültesi, Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü, s.orkin@alparslan.edu.tr ORCID: 00000-0001-6505-5684*

***Article History/Makale Tarihi:***
*Received/Teslim* : 27.09.2024
*Accepted/Kabul* : 30.11.2024
*Published/Yayımlama* : 30.11.2024

***Cited/Atıf:***
Orkin, Ş. (2024). Rezê Jîyanê Dîvanı'ndan Yaşama Dair Öğütler. *Bulanık MYO Sosyal Bilimler Dergisi (BULSODER), Bulanık Sempozyumu Özel Sayısı 1*, 20-32.

***Copyright/Telif Hakkı***
*Bu makale, Creative Commons Atıf-GayriTicari 4.0 Uluslararası Lisansı (CC BY NC)'nın hüküm ve koşulları altında dağıtılan açık erişimli bir makaledir.*

## DESTPEK

Mela Eladînê Kopî, yek ji şairên navdar ê edebîyata klasîk a Kurdî ya îroyîn e. Bi eslê xwe ji gundê Mela Mustefayê Kopê ku girêdayê Mûşê ye. Di sala 1937an de hatîye dinê û niha li Kopa Mûşê dijî. Mela Eladîn ji eşîra Memanî/Memanan e û navê bavê wî jî Efdelê kurê Heyder e. Di temenek biçûk de dest bi xwendina Qur'anê û ilmê kirîye piştî xwendina Qur'anê berhemên Kurdî yên ji bo xwendina feqîyên mizgeft û medreseyan wek Mewlûd û Nûbihara Biçûkan xwendîye. Li gelek gund û navçeyên cuda ji seydayên navdar ders girtîye û kitêbên rêzê yên medreseyê jî xwendîye (Aykaç, 2020: 112).

Dîwana Rezê Jîyanê ya Mela Eladînê Kopî bi rastî jî ji serî heta dawîyê bi şîretên cur bi cur tijî ye. Lê di vê xebatê de bi tenê çend serenavên giştî hatine hilbijartin û ji wan şîretan hin nimûneyên balkêş hatine tesnîf û tehlîl kirin. Bi taybetî ji bo milletperwerî, edaleta civakî û şexsîyeta maqûl eger ku hemû şîretên berhema Kopî bêne civandin dê xebateke pir dirêj derkeve holê. Helbet meriv dikare bibêje ku ev şîretên bi Kurmancîyeke xweş û herikbar hatine nivîsîn di gelek mijaran de hevdu dubare kirine. Ji ber vê yekê di vê xebatê de hin beytên nimûne hatine hilbijartin lê yên ku heman mijarê dubare dikin nehatine dayîn.

Mela Eladînê Kopî ku seydayekî navdarê herêma Kopê (Bilanixê) ye ji berhema wî tê zanîn ku ji mîrasa edebîyata klasîk a Kurdî gelek îstîfade kirîye. Ji terz û mefhûm û şiklê helbestên Mela Eladîn meriv dikare bibêje ku wî, daye rêça Melayê cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqîyê Teyran. Jixwe wî di helbestên xwe de îşareta van şaîrên navdar ên Kurd kirîye û behsa mîrasa bi qîmet a edebîyata klasîk a Kurdî jî kirîye.

Ji wê guldeste çêkin — Ji bo Xanî bi rêkin
Bi wê dilê wî şad be — Ji nû ve can abad be
Ji wê guldeste çêkin — Ji bo Melê bi rêkin
Bi rêzê lê selav kin — Cezîrê pê têrav kin
Ji bo Feqîhê Teyran — Ewê bi geşt û seyran
Teva esans û reyhan — Verêkin bo Bedirxan
Jibîr nekin Sîyahpoş — Ewê ji eşqê pircoş (r. 49-50)

Mela Eladînê Kopî di dawîya berhema xwe de hem bi nezmê hem jî bi jêrenotê behsa Dîwana xwe dike û bi awayekî kurt behsa xwe jî dike. Hem di jêrenota xwe de hem jî di xatîmeya dîwanê de wî anîye ziman ku vê berhema xwe di encama gelek zehmetîyan de qedandîye. Di peydakirina peyvan de ketîye tengasîyê û di pêvajoya helbestnivîsîyê de herdem alîkarî ji Xweda xwastîye. Di du beytên xatîmeyê de jî anîye ziman ku ew naxwaze berhema wî di cihê xwe de bimîne û neyê zanîn. Lewra her berhemdarek dixwaze ku berhema wî navdar be, bi fayde be da ku keda wî pûç nebe. Ji bo hemû berhemên ku bi zimanê Kurdî hatine nivîsîn û berhema Mela Eladînê Kopî jî meriv dikare bibêje ku bi xebat û vekolînên zanistî dê ev berhem wekî stêrkên edebîyata klasîk bêne nasîn û bibiriqin. Behemeke din a Mela Eladînê Kopî ku di van demên dawîyê de ji alîyê weşanên peywendê ve hatîye çap kirin heye (Kopî: 2024). Ev berhema bi navê Jîyana Pîroz jî di nav xwe de gelek şîret dihewîne ku ji bo fêmkirina nêrîn û fikrên Mela Eladînê Kopî berhemeke hêja ye. Lazim e ku di derbarê berhema Mela Eladînê Kopî de du xal bêne destnîşan kirin. Ya ewil ev berhem her çi qas navê wê Dîwan be jî di warê şiklî de zêdetir dişibe mesnewîyê. Lê berhema Mela Eladîn wekî dîwaneke muretteb nebe jî ji bo ku wî navlêkirineke wiha kirîye yanê navê berhema xwe danîye Dîwana Rezê Jîyanê, em ê jî berhema wî wekî dîwan qebûl bikin. Lewra li derveyê hemû pîvanan navlêkirina şairan jî pîvaneke muhim e ji bo berheman. Xala duyem jî ew e ku ev berhem bi wezna erûzê li gorî "mefa'îlûn fe'ûlun mefa'îlûn fe'ûlun" hatîye nivîsîn di piranîya beytan de ev wezn xwe nîşan dide lê belê di hin beyt û misreyan de wezn xerab dibe.

Elaeddîn mela ye — Ji bo Heqqê feda ye
Bi vê xwe zêde êşand — Heta ku ev nivîsand
Ji bo bibîne woşe — Diêşand zêde hoş e
Niyaz dikir bi zarî — Dixwaste arîkarî
Umîddar im ji bo xwe — Bibîne cih neroxe
Nemîne rû veşartî — Di kuncê teng û tarî (r. 196-197)

Ji xeyrê helbesta jorê wî di rûpela 200an a Dîwana xwe de dîyar kirîye ku di 29ê Nîsana sala 2010an de berhema xwe li Ceyhana Edeneyê qedandîye. Di vê jêrenotê de Mela Eladîn dîyar kirîye ku meqseda wî xizmeta dînê Îslamê û xizmeta gelê wî ye. Her wiha anîye ziman ku bi nivîsîna berhemeke Kurdî xwastîye ku li pirtûkxaneya Kurdî kitêbek zêde bike. Bi terza Se'dîyê Şîrazî beyteke wiha jî di jêrenota xwe de nivîsîye:

| | |
|---|---|
| Xerez neqş e ji me şûn va bimîne | Ji bo jînê dewamî lewra nîne (r. 200) |

Di vê xebatê de vekolîn, bi metoda tehlîl û analîza metn û helbestên klasîk hatîye kirin. Di qada edebîyatê de bi taybetî di qada edebîyata klasîk de ev metod di gelek xebatên lîsansa bilind û doktorayê de têne bikaranîn ku ji bo tespît kirina naverok û mene û gelek taybetîyên din ên helbestan, metoda tehlîla metnê bikêrhatî ye û pir tê bikaranîn. Di vê xebatê de jî hemû berhema Mela Eladînê Kopî hate vekolîn û di nav berhema wî de hêman û mijarên di derbarê şîretê de hatine tespît kirin û tesnîf kirin. Piştê tespîta şîretên nav beyt û misreyan û tesnîfa serenavan her şîretek Mela Eladîn hate tehlîl û analîz kirin da ku di tevahîya berhema xwe de peyamên ku xwastîye bide xwendevanan çêtir werin zanîn.

**Şîretên di Dîwana Rezê Jîyanê de**

Şîretên Dîwana Rezê Jîyanê di binê şeş serenavan de hatine tehlîl kirin. Di serenava ewil de şîretên li ser milletpwerwerîyê hatine vekolîn ku Mela Eladîn bi rastî di berhema xwe de giranîya xwe daye ser vê mijarê. Serenava duyem şîretên li ser ehemîyeta dînê Îslamê ye ku Mela Eladîn, bi şîretên xwe di navbera dîn û mîlletpwerwerîyê de têkilîyên balkêş îşaret kirîye. Serenava sêyem şîretên li ser nefs û aqil e. Serenava çarem di derbarê edaleta civakî de ye ku ev mijar jî bi serenavên din re têkildar e. Lewra li gorî Mela Eladîn milletpwerî bi rêya dîn çêdibe û edaleta civakî jî ancax bi milletpwerîya musbet pêk tê. Di serenavên pêncemîn û şeşemîn de jî şîretên Mela Eladîn ên di derbarê şexsîyeteke maqûl û ehemîyeta xwendina 'ilmê de hatine vekolîn.

**1. Şîretên ji bo Milletperwerîyê**

Fikra milletperwerîya Mela Eladînê Kopî ji alîyek ve di tesîra Seîdê Nûrsî (1877-1960) de şikl girtîye. Li gorî Seîdê Nûrsî, her alîyekî xerab ya însên lazim e bi ziddê xwe yanê bi alîyên baş bêne kontrol kirin. Her wiha milletperwerî jî alîyekî însanî ye ku eger neyê kontrol kirin vedigere nijadperestîyê. L eger ku ev taybetîya tebî'î bi qencîyê ve bê xemilandin wê çaxê dibe milletperwerî ku Sedî Nûrsî ji bo vê dibêje milletperwerîya musbet. Her wiha li gorî Nûrsî milletperwerîya musbet bi dîn re dimeşe lê milletperwerîya menfî yanê nijadperestî ji dîn dûr e (Mutlu,1994:29-30). Di vê çarçoveyê de helbesta jêrê di destpêka berhema Mela Eladînê Kopî de di beşa yekem serenava "Axaftina Berbûkê Bi Bûkê Ra" cih girtîye ku balkêş e di destpêka berhemê de şair bi 32 beytan şîretên milletperwerîyê li xwendevanan dike.

Di tehlîla metnên klasîk de ji bo her mesele û her mezmûnek hin beyt hene ku bi rastî gelek car hijmara van di tevahîya dîwana şairan de pir jî zêde nîne. Lê hê di destpêka berhema Mela Eladînê Kopî de ev qas zêde beyt ji bo şîretên milletperwerîyê bala meriv dikêşe ku ev şair giranîya xwe bi awayekî ciddî daye ser vê meseleyê. Di beytên jêrê de şair bi zimanê berbûkê di derbarê milletperwerîyê de hin şîretan tîne ziman. Di beyta ewil de helbestvan ji peyva perdeyê îstifade dike ku perde ji bo veşartina tiştekî tê bikaranîn. Mesela ji bo malan perde ji bo veşartina dîmenên nav xanî tê bikaranîn. Di helbesta klasîk de jî perde di meneyên wekî veşartin û asteng kirin tê bikaranîn ku li vê derê helbestvan dîyar dike ku hêz û qudret û mehareta milletê Kurd îro veşartî maye, li pişta perdeyê maye. Her wiha lazim e ku Kurd ji rewşa veşartîbûnê yanê ji pişta perdeyê derkeve meydanê ku şair vê jî bi misreya "derên nav mêr û merdan" beyan kirîye.

| | |
|---|---|
| Pêwist e em ji perdan | Derên nav mêr û merdan |

Ji beyta diduyan heta beyta heftan şair, piştê ku Kurd derêne meydanê lazim e ku li meydanê çi bikin dîyar kirîye û şîretên wiha li xwendevanan kirîye: Ewil ji bo Kurdan şîreta kar û xebatê dike ku di her qad û her milê de xebatek ku meqseda wî dîyar e şîret kirîye. Kar û xebat têne kirin lê di xebatê de meqsed muhim e. Însan mumkun e ku ji bo xerabîyê yan ji bo meqsedên xerab yan bi tevahî ji bo meqsedên şexsî kar bike. Lê li vir Mela Eladînê Kopî tîne ziman ku lazim e meqseda easil pêşxistina welêt be. Bi kurtahî dibbêje ku Kurd, pêşî divê ku bi meqseda menfeeta welatê xwe kar bikin. Di beyta sêyem de tîne ziman ku lazim e Kurd ji bo parastina talanên xwe yanê her çi tiştekî ku bi dest xistine hewl bidin û cerdevanî û nobedarîyê bikin. Ji bo ku di roj û dewra me de bê qudreta maddî mumkun nîne ku meriv pêş bikeve şair dîbêje ku lazim e Kurd bi şev û roj newestin û kar bikin û her wiha li cem xwe ji bo menfeeta civak û milletê xwe hêz û mal bicivînin.

| | |
|---|---|
| Bikin kar û xebatê | Ji bo evî welatê |
| Li rû vê axê, erdê | Bikin talan û cerdê |

Bi roj û şev bikin kar | Bibin bi hêz û maldar (r. 18)

Di beyta jêrê de şîret berdewam dike ku şair balê dikêşe ser cotkarîyê û ehemîyeta cotkarîyê ji bo pêşketina Kurdan dîyar dike lê li vir bi huner bîlev dike ku di xaka xwe de ne bi tenê tovên ji bo cotkarîyê biçînin. Tovên milletperwerîyê jî di xaka xwe de biçînin ku her şexsek xwedî huner û hêz û qudret ji bo pêşeroja milletê xwe ji menfeeta zarokên qewmê xwe kar û xebat bike. Her wiha bi vê şi'urê qudreteke mezin dê derkeve holê û ji bo qencîya milletê Kurd bi şev û roj xebatan bike. Li vir hêmaneke pir muhîm heye ku ji alîyê gelek şair û zanayan ve tê gotin lê baş nayê îdrak kirin. Xweda ji bo her evdekî xwe huner û qudretên cuda cuda daye û ji bo hin evdan xassîyetên pir hêja daye ku şi'ura milletperwerîyê dema di tevahîya milletekî de belav bibe ev wekî baca dewletê ye ku ji bo her şexsekî belkî qîmetek wê ya biçûk hebe lê dema ku bi hezaran însan bac didin êdî bi wan bacên komkirî organîzasyonekî wekî dewletê ku mezintirîn organîsyona însanan e li ser pîyan dimîne hebûna xwe berdewam dike. Her wiha her şexsekî ku ji xaka milletperwerîyê bi awayekî qenc gihîştibe dê ji bo menfeeta giştî ya milletê xwe kar bike ku ji zarokan heta pîr û kalan ji heywanan heta gul û giyayên wê erdnîgarîyê dê ji vê qencîya kombûyî sûdê wergire.

Erdê xwe cot û şov kin | Bi tovê qewmî tov kin
Li kax û koh û deştan | Newal û şax û bestan
Em lê çikînin daran | Ku lê bibare baran (r. 18)

Hetta vê derê karên ku divê bê kirin hene lê di vê beytê de êdî semereya kar tê dîyar kirin. Yanê ev hemû kar û tedbîr eger ku ji alîyê Kurdan ve bên kirin dê ev netîce jî bi awayekî tebiî derkevin holê. Çi ne ev semere: eger ku şexs zana û bi qudret bin û vê hêza xwe ji bo menfeeta xelqê xwe bikar bînin dê welatê ku lê dijîn jî hêzdar û dewlemend bibe. Şair dibêje ku ev karê qencîkirina li xelqê xwe dê bi xwe re xêr û bereketê jî bîne. Şair tîne ziman ku dirav yanê pere û mal û pişt re jî çek yanê qudretê bi dest bixin. Di roja me de nêrîna mirovan ji bo mal û dewlemendîyê wekî berê ye yanê meriv dikare bibêje ku pir guherînek di mijara daxwazîya dewlemendîyê de tune ye. Lê belê çek yanê qudret êdî xwedîyê gelek alîyên cuda ne. Pêşî lazim e ku bê gotin bingeha çekê yanê qudretê bi malê ve girêdayî ye ku şair dibe ku ji ber vê yekê pêşî dibêje dirav bi dest xin paşê behsa çekê dike. Û di vê çaxê de çek yanê qudret dibe ku sîyasî be dibe ku civakî be dibe ku ilmî û hunerî be. Bi çi awayî dibe bila bibe ji bo parastina menfeetên xelq û ji bo pêşxistina berjewendîyan qudret lazim e ku ew qudret jî divê ku li gorî derfetên îroyîn be da ku bi kêr were û bi tesîr be.

Di beyta dehan de şair cîhanê yanê dinyayê ji me ra terîf dike ku dibêje ew mîna keçikek bi naz e. Tîne ziman ku dinya ji bo derfetan bide milletan wekî bûkan ji me mehra xwe dixwaze. Heta ku ew mehr yanê ew berdêl neyê dayîn, dinya ji bo tu milletekî rûyê xwe yê geş venake. Dîsa şair bi xwe vê mehra ku cîhan ji me dixwaze beyan kirîye ku ew mehr, hêz û himmet yanê hewl û xîret e. Dema hewl û xîret bi ilm û sen'etê ve bê cem hev û bi îttifaq be, wê çaxê cîhan ji bo me wekî bûkê rûyê xwe yê geş dê veke. Ji destpêka helbestê heta beyta 24an Mela Eladînê Kopî heman meseleyê bi mînakan ve berfirehtir dike û dibêje, bi tenê beyta 43yan de, "Nema di wan da 'illet Gerîn bi rastî millet" balkêş e ku li vir şair şertên milletbûyînê anîye ziman ku heta ev şert pêk neyên, yanê heta fikra milletperwerîyê di xaka welatekî de neyê çinîn û pişt re her şexs ji bo qencîya milletê xwe nebe xwedî qudret û ev qudretên cuda cuda bi îttîfaq nebin yek tu kom nabe millet. Her wiha şair nîşan dide ku ev her şertekî di heman demê de îlletek e yanê kêmasî û nexweşîyek e ku heta neyê qedandin heta komên însanan ji van kêmasî û îlletan pak nebe nikare bigihîje asta milletbûyînê.

Welat zengîn û têr be | Bi hêz û xêr û bêr be
Dirav û çek bi dest xin | Ji bo me ew bi nirx in
Cîhan keçek bi naz e | Ji me mehir dixwaze
Mehra wê hêz û hîmmet | Tifaq û 'ilm û sen'et
Gelên bindest û hêsîr | Reha bûn wer ji bin nîr
Tevahev wan kirin kar | Gerîn bi mal û maldar
Xwendin wan ilmê hikmet | Tevaya fennê sin'et
Nerawestîn, kirin kar | Gerîn zengîn û zanyar
Tevahev çûn di rê de | Efraz bûn pêde-pêde
Gerîn ronak û hişyar | Ji bo welat evîndar

| | |
|---|---|
| Li rê çûn ew tevahev | Wekî hev bûn dil û dev |
| Nema di wan da ‘illet | Gerîn bi rastî millet |
| Hucûmê dan neyaran | Fenanî tîremaran |
| Li dora hev gerandin | Bi xenceran dirandin |
| Fesal li wana anîn | Ji axa xwe deranîn |
| Netew zelal û saf bû | Berê ew şêlû xav bû |
| Gerî bi hêz û quwwet | Li dar xist bo xwe dewlet (r. 19) |

Ji vê derê pê de jî êdî di beytan de şair anîye ziman ku eger ku hûn van şîretên min guhdarî nekin van karên ku divê bêne kirin hûn nekin dê encamên wiha xerab derkevin holê. Ev usûl ji bo bi tesîrkirina şîretan gelek bikêrhatî ye. Şair bi hostetî pêşî şîretan dike, paşê dibêje ger ku hûn şîretan guhdarî bikin dê hûn ê bigihîjin filan filan astên bilind. Pişt re jî şair hişyarî dide ku ger hûn van şîretan guhdarî nekin û pêk neynin jî dê xerabîyên wiha bêne serê we ku bi vê usûlê tesîra gotin û şîretê li ser guhdaran dê zêdetir bibe. Şair di beyta jêrê de dibêje em jî ji hev revîyan ku li vir cînavka “em” bikaranîye û meqseda wî êdî kêmasî û îlletên Kurdan e. Îlleta ewil li gorî beyana şair ew e ku hezkirinek di navbera kurdan de nehatîye saz kirin ku delîlê “ji hev revînê” kêbûna hezkirinê ye. Dema ku fikra milletperwerîyê di piranîya civatê de tune be, her kesekî menfeeta xwe ya şexsî li ser menfeeata milletê xwe bigire û hetta ji bo menfeeta xwe ya şexsî zerarê bide menfeetên milletê xwe helbet di navbera kesên wiha de hezkirin nayê wicûdê û komek wiha êdî ne mumkun e ji hev bawer bike û bi emnîyet pişta xwe bispêre hemwelatîyê xwe. Ev illet dibe sedema çi? Dibe sedema belabûyînê yanê îttifaqê xerab dike ku şair vê tiştê şibandiye dilopê ku ev şibandin gelek bi hikmet e. Her ferdekî civakê mîna dilopek e ku dema ev dilop ji ber hin illetan ji hev bela wela bû tu tesîr û qîmeta wê namîne tu hêza wê jî çênabe. Lê dema ku her dilopek mîna baranê xwe ji illetan bişo û bi îttifaq bibe yek wê çaxê dibe pêl û behr ku tu bend û asteng nikare li pêşîya qudretek wiha raweste. Di beytên berdewamîyê de Mela Eladînê Kopî belabûna Kurdan teswîr dike ku hin belkî bi kêmbûna ilmê li serê çîya û newalan bela bûn. Hin li ser mîrata bav û kalên xwe ji halê xwe razî man û sekinîn. Hin di kêf û zevqê de xerq bûn û hay ji xelqê xwe neman. Bi kurtasî şair beyan kirîye ku Kurdan qîmet û hêza îttîfaqê îdrak nekirin û li hev xwedî derneketin ku her neyarek ji Kurdan hez nekir dema vê kêmasîya mezin dît wekî teyrê nêçîrvan yanê wekî başok xwe li ser Kurdên bela wela bûyî da. Her wiha di encama guhdarînekirina şîretan de hêsîrî bi dest ket.

| | |
|---|---|
| Em jî, ji hev reviyan | Dilop dilop rijiyan |
| Hin çûn çiya û şaxan | Newal û koh û kaxan |
| Hin man li deşt û palan | Li warê bav û kalan |
| Hin man li dora avan | Li seyd û seyr û ravan |
| Nirxa komê nezanîn | Li hevdû hîç nebanîn |
| Neyar evî ku zanî | Fena başok lê danî |
| Li ser pehn bû fena kurk | Givaşte me fena xirk |
| Em man di bin da hêsîr | Wekî gayê di bin nîr (r. 18-19) |

Di mijara milletperwerîyê de yekîtî xaleke muhim e ku Mela Eladînê Kopî di nav berhema xwe de gelek car di nav helbestên cuda de behsa yekîtîyê kirîye. Ne mumkun e ku meriv hemû beytên di derbarê yekîtîyê de li vir bide lê bi taybetî helbestekî Mela Eladîn heye ku navê wê “Çîroka Morî û Keftar”e û di vê çîrokê de mijar seranser yekîtî ye. Li gorî çîrokê morî di nav yekîtî û nîzamê de bi hev re kar kirine lê keftarek warê wan û erzaqên wan talan kirîye. Morî di vê rewşê de yekîtîya xwe cardin saz kirine û ji xwe re rêberek hilbijartine û bi yekîtî êrîşê keftarê muzir kirine û wî kuştine. Her wiha hem ji neyarê xwe xelas bûne hem jî ji bo xwe û nesla xwe jîyanek bi ewlehî ava kirine. Mela Eladîn piştê vê helbestê helbestekî din bi heman mijarê nivîsîye ku navê wê jî “Dersgirtina Ji Çîroka Morîyan” e ku di vê helbestê de jî dîsa behsa ehemîyeta yekîtîyê tê kirin. Ji bo nimûne hin beytên helbestê wiha ne:

| | |
|---|---|
| Mîsalek dî bibêjim | Ku dozê pê bipêjim |
| Li morîyan bifikre | Ji wan jî dersê bigre |
| Ewana jar û hûr in | Welakîn pir cesûr in |

Keftarekî diranbirr Li rê çû ta gihîşt wir
Qewî bû nola hirçê Pencê wî nola xilçê
Bi lotik û bi firqaz Hemîşkan kir belengaz
Ji warê xwe neçûn mûr Berî nedan rêya dûr
Neqandin bo xwe mîrek Bi hêz û hoş û jîrek
Berê xwe dane keftar Ewê mexrûr û pir har
Wilo mûrî biserket Tifaqê dayê dayê derfet (r. 53-54)

Di helbestên din ên Mela Eladîn de ku behsa Dewleta Eyyûbîyan tê kirin û behsa Siltan Selaheddîn tê kirin de jî gelek car mînak tên dayîn û tê xwastin ku ehemmîyeta yekîtîyê bê beyan kirin. Ji ber ku ji van helbestan nimûne dayîn dê bibe tekrar û vê metna vekolînê pir dirêj bike ev nimûneyên heta niha hatine dayîn kafî hatîye qebûlkirin.

**2. Şîretên ji bo Ehemîyeta Rêya Dînê Îslamê**

Mijara dîn û ehemîyeta dîn di helbestên Mela Eladînê Kopî de gelek car hatîye îfade kirin. Dîn ku ji alîyê rayeka peyvê û etîmolojîyê ve meneyên cuda dide lê li gorî çavkanîyên Îslamî dîn di meneya ceza û mukafatê de di meneya serdestbûyî û desthilatdarîyê de û di meneya telîmîyet û îtaetê de tê bikaranîn. Lê di nav van de meneya herî berbelav meneya rê, rêzik û mezheb û şerîetê ye (Tümer,1994:312). Mela Eladînê Kopî di berhema xwe de Bûk û Berbûkê daye axaftin bi zimanê wan menzumeyek honaye. Berbûk şexsekî milletperwer û sekuler e lê bûk hem milletperwer û hem dîndar e. Di hin cihan de şîretên giştî ji bo milletperwerîyê hatine dîyar kirin lê di hin cihan de şair bi zimanê Bûkê behsa milletperwerîyeke dîndar dike. Milletperwerîyeke wisa ku bi dîn re ne dijmin e hetta gelek rê û rêzikên xwe ji bingehên dînî werdigire. Mesela di beytên jêrê de şair wiha gotîye:

Lingê xwe bavê hêdî Kî hêdî çûyî rê dî
Giranî xûkî çê ye Ewa xûyê Xwedê ye
Lezgînî karê şeytan Ewî xapokê însan (r. 24)

Li helbestê dixuyê ku rexneyek li tevgerên sîyasî yên Kurdan heye. Mela Eladînê Kopî dîyar kirîye ku ji bo di heyatê de gihîştin û çêbûna her tiştî zemanek divê bi heman awayî ji bo xurtbûn û pêşketina milletan û tevgeran jî zeman û xebatên bi hikmet divê. Ew di serî de hemû kar û xebatên ku bi darê zor û eceleyê dixwazin serkeftî bibin rexne dike û tîne ziman ku karên bi sebr û giran ji eceleya şeytan çêtir e. Li vir şair ji bo xurtbûna milletan ehemmîyeta dîn derdixe pêş û di beytên jêrê de ehemmîyeta bi cih anîna fermanên Xweda zêdetir îzah dike.

Hevala zêde dilsoz Xwedî-de'wa xweyî doz
Dixwazî ger beratê Ji bona vî welatê
Wekî nîzama Barî Li rê be ta dikarî
Rêya te rêke dûr e Nîzam ji bo te nûr e
Nigê xwe bavê wek wî Tewfîq tu nabe bê wî
Bihêle pêda pêda Her tişt herin di rê da
Bila bi hêdî gir bin Ji bo azad û hurr bin
Bi zorê wan givir kî Tuyê hemîşkan qir kî (r. 25)

Li gorî beytên jorê şair şîretan bilêv dike ku her kesekî tewfîq û serkeftinê dixwaze lazim e ji nîzaman Xwedayê Barî bê xeber nebe. Mela Eladînê Kopî destnîşan dike ku rêya milletbûnê û wekî millet rêya serkeftinê ne rêyek kurt û hêsan e. Ev rê ji bo ku rêyek dijwar û dirêj e nîzaman Xweda yanê usûl û qaîdeyên dînê Xweda di vê rêya dijwar û dûr de mîna nûrê û ronahîyê rêya meriv ronî dike. Di du beytên dawî yên jorê de jî Mela Eladîn balê dikêşe ser xalek pir muhim. Ew dîyar dike ku eger kar û xebat li gorî dînê Xweda nebe û bi zûtî û ecele meriv bixwaze biserkeve ji ber bê sebrîyê meriv dê zerarê bide xwe û civata xwe.

Di beytên jêrê de Mela Eladînê Kopî di derbarê dînê Îslamê de û di derbarê îttifaq û yekîtîya ku bi rêya dîn tê saz kirin de şîretên balkêş pêşkêşê xwendevanan kirîye. Ew pêşî şîreta îmananînê li xwendevanan dike ku pêşî

lazim e meriv bi Xwedayê Rehman îman bîne. Pişt re ew heqîqetek bi rêya şîretê tîne ziman ku ev heqîqet ji bo çêbûna civakek misilman ehemîyeteke bingehin di xwe de dihewîne. Mela Eladîn dîyar dike ku ji bo kesên ehlê îmanê hezkirin û muhebbet lazim e ku her kesekî di dilê wî de îman hebe divê ku ji birayê xwe yê ehlê îmanê hez bike û şîyar be. Lewra şîyarî ji bo ku meriv nekeve davikên şeytên lazim e. Şeytan ji bo ku muhebbeta navbera ehlê îmanê bişkîne bi hezar cure amûran hîleyan çêdike ku birayan ji hev re bike neyar. Piştê muhebbetê Kopî tîne ziman ku lazim e civakek nû were saz kirin û her wiha li ser serê vê civakê jî îmam û rêberek hebe. Jixwe gelek bi berfirehî behsa menfeetên mezin yên îttîfaqê hatibû kirin ku teyîn kirina îmamek yanê revebirek qenc ji bo Kurdan di heman demê de sazkirina îttîfaqekî ye. Piştê ku îmamek hate teyîn kirin êdî ji bo wî îtaet lazim e ku civak divê di bin emrê rêberê xwe da be da ku bi usûl û silametî kar bêne kirin. Ji xeyrê vê Mela Eladîn kufr, înkar û şirkê wekî xerabîyên mezin yên ser rûyê erdê dibîne û bi vê îttîfaqa saz kirî û civaka qenc dîyar dike ku kufr û şirk dê li ser rûyê erdê tune be. Bi tune kirina xerabîyan ve dîbêje ku civaka qenc dê ji ser xaka xwe ceng û xerabîyan jî hilîne. Û bi rêya dînê pak dê gemara kufrê tune bibe ji bo welat nûbihar were.

| | |
|---|---|
| Divê tu bînî îman | Bi yaweranê Rehman |
| Divê mu’min şîyar bin | Ji bona hev ra yar bin |
| Ji nû saz kin civakek | Te‘yîn bikin îmamek |
| Serî ji bo ra xwar kin | Wekî emrê wî kar kin |
| Ku rakin kufr û şirkê | Înkarê têxin xirkê[1] |
| Hilînin ceng û cerdê | Ji rû vê axê, erdê |
| Verojin jê gemarê | Werînin nûbiharê (r. 32) |

Mela Eladînê Kopî di serenavek berhema xwe de behsa destûrên Xwedayî (Îlahî) kirîye ku li vê derê gelek delîlan ji bo heqbûna rêya Îslamê anîye ziman. Li gorî beyana wî Xweda, alemê di nav miwazeneyek de bi rêk û pêk û bi hikmetên mezin xulq kirîye ku ew pergala cîhanî ne tiştekî bihûrbar e. Aqilê însên, bi tenê heta cihek wê pergala ‘ezîm dikare îdrak bike û lazim e ku ‘evd bi wê pergala Xwedayî re hevkarî bike ku bi hevkarîya însan û pergala Xwedayî ya di alemê de kar û jîyan dê çêtir û xweştir bibe. Lê belê li dijî wê pergala Xwedayî tevger kirin dê di tebî‘etê de fitne û xerabîyan derxe holê.

| | |
|---|---|
| Dema Xwedê cîhanê | Bi rewş û rengê hanê |
| Ji naheyînê saz kir | Destûrên pir di nav kir |
| Rehkûr in dorepêç in | Li her cih wana rêç in |
| Zindî ne tev giyandar | Tu nabîn pîr û kevnar |
| Kesê dijî wê kar ke | Ew ê termê xwe sar ke |
| Desatîrê timî ne | Ne koçer û demî ne |
| Ji bo jîn û jiyanê | Pêwîst in her zemanê |
| Îradeya Xwedê ye | Cîhan bi wê li pê ye (r. 35) |

Di berhema Mela Eladînê Kopî de li dû gelek helbestên ku tê de behsa erd û hewa û heywan û giyayan tê kirin di dawîyê de behsa nîzama bêqîsûr a Xweda jî tê kirin û ev wekî tekrarek e li dawîya gelek helbestan. Meqsed ji tekrarê ne dubarekirina beytan e. Mela Eladînê Kopî heman peyam û meneyê bi misre‘ên cuda cuda li dawîya gelek helbestan dayê. Ji bo vê mînak gelek in lê bi tenê ji ser yek nimûneyek li jêrê ve dê çêtir bê dîtin ku Kopî çawa behsa nîzama Xwedayî ya alemê kirîye. Her wiha Kopî muqayeseyek di navbera nîzama Rebbê alem û nîzama desthilatdarîyên beşerî dike ku li gorî beyana wî nîzamên beşerî wekî xwedîyên xwe yanê wekî beşerê fanî û bi qisûr in lê nîzama Rebbê alemê bêqisûr û ebedî ye.

| | |
|---|---|
| Enwa‘ê zerzewatan | Giya û dar, nebatan |

[1] Mengene

| | |
|---|---|
| Li rû erdê hêşîn bûn | Candar bi wan nûjîn bûn |
| Ev qanûna Xwedê ye | Cîhan bi vê li pê ye |
| Qanûna mîr û şahan | Qiral û padîşahan |
| Fenanî wan dibe pîr | Diçe ji bawer û bîr |
| Nîzama Rebbê alem | Ciwan e, nû ye herdem (r. 42) |

Mela Eladîn di helbesteke xwe de ku navê wê "Sûda Îmanê Ji Bo Doza Hanê" behsa ehemîyeta dîn û îmanê dike. Bi rastî mijara vê helbestê seranser ew e ku şair beyan dike ku di encama tecrubeyên xwe de gihîştîye wê fikrê ku milletê Kurd, ancax bi rêya dînê Îslamê dikare yekîtîya xwe pêk bîne. Lewra li gorî terîfa şair dînê Îslamê, civatê hişyar û ciwan dike li dora doza heq dicivîne û hêzdar dike û her wiha xelq dibe xwedî îttifaq. Dîsa Mela Eladîn di dawîya gelek helbestan de dîyar kirîye û xwendevanên xwe hişyar kirîye ku kesên bêîman bin tu car sûd û faydeyê dê nedine Kurdan lewra li gorî Mela Eladîn, ê ku bê nimêj û mizgeft be yanê ji dîn û civat û çand û edetên xwe dûr be ew dê ji bo qewmê xwe jî bêbext be.

| | |
|---|---|
| Bizan tişta me kom ke | Bi wê doza me dom ke |
| Bide me hêz di cengê | Ji me veroje jengê |
| Bibexşe me îradê | Ji me dûr ke fesadê |
| Me têxe yek civatek | Xwedanê yek welatek |
| Bizan ew sade dîn e | Min anî pê yeqîn e (r. 72) |
| Kesên ku bêîman e | Ji bo me sûdê nayne |
| Ewên bê mêj û mizgeft | Ji bo wan hîç nehin bext (r. 73) |

### 3. Şîretên di Derbarê Nefs û Aqil de

Nefs, di meneya xwe ya bingehîn de wekî esl û esasê hebûna tiştekî tê terîf kirin. Yanê ji bo berdewamîya hebûna tiştekî yan şiklekî ew eslê ruhanî nefs e. Lê digel vê nefs, di qada merîfetê de meneyên din jî werdigire ku ev mene daxwaz û hewesên xerab, fiilên xerab, quretî, kîn û exlaqê xerab e (Kaşanî,2015:557-558). Hem di edebîyata klasîk de hem jî di berhemên klasîk de nefs ew tişta zindî û hissî ye ku di warê hebûna xwe de ne maddî ye û hebûnek ji bedena maddî cudatir e (Uludağ,2006: 527). Mela Eladînê Kopî ji ser tecrubeyên xwe yên jîyanê û îlmê xwe ve di derbarê alema menewî ya însên de jî hin şîretan nivîsîye. Ev şîretên wî wekî gotinên pêşîyan bi hikmet û tijî tecrube ne. Ji bo xwedevanan ew pêşî rêya rast pêşnîyaz dike û dibêje kesên ku li rêya rast nebin teqez dê encama karê wan jî rast û durust nebe. Şair di helbesta xwe de cewaba pirsa rêya rast kîjan rê ye jî dide. Li gorî terîfa wî rêya rast bi tenê rêya hiş û eql e. Rêya nefs û daxwazîyên maddî ku bi eql neyê kontrol kirin û sînordar kirin dê di netîceyê de meriv têxe qefesê û mehkum bike. Bi tenê kesên ku dikarin daxwazîyên nefsê bi îradeya xwe û bi rêya eql sînordar bikin dikarin ji esareta nefsa xwe azad bibin. Her wiha rêya nefs û şehwetê rêyek nêzîk û hêsan dixuyê lê tê de xisaretên mezin heye lê rêya hiş û eqlî rêyek dirêj û zehmet bixuyê jî di wê rêyê de azadî û dilxweşî heye.

| | |
|---|---|
| Nebe rêwî li ya wxar | Kilor dibî tevî bar |
| Nebe yexsîrê nefsê | Te dadixîne hefsê |
| Nebe mexlûb ji bo hest | Dibî mehkûm û bindest |
| Timî here li dû hoş | Dibî azad û dilxwoş |
| Di vê rêya xwe ya dûr | Bigêre sebrê destûr (r. 28) |

Mela Eladîn bi rastî di gelek beytan de di nav şîretên di derbarê yekîtî û xwendin û milletperwerîyê de behsa wesfên xerab yên nefsê dike û tîne ziman ku meriv lazim e xwe ji van wesfên xerab dûr bigire û hertim qencî û başîyê bide pêşîya xwe. Mesela di beytên xwe ya jêrê de raste rast behsa hesûdî û kînê kirîye û li xwendevanan şîret kirîye ku bi pêşçûna cîran û hevalên xwe divê ku meriv kîndar û hesûd nebe lewra bi vê hesadetê meriv dibe pêlîstoka şeytên.

| | |
|---|---|
| Mejo kîn û hesed caran | Bibare ku li te baran |
| Bike herdem tu qenckaran | Nekêşe xelqê êtûnê |

Cîranê te bibe paşa    Ji wî buxzê neke haşa

Ji bo şeytan mebe maşa    Neşoje tu ewê pûnê (r. 147)

Di derbarê nefsa har de Mela Eladîn beyan kirîye ku kesê nefsa wî har be û xwe ji xelqê xwe çêtir bizane her wiha li xelqê xwe ezîyet bike ew bûye xulamê nefsa xwe û di xerabîyê de ye. Lazim e ku meriv nefsa emmare wekî kûçik bizane û nebe hêsîrê nefsê.

Ji xelqê tirş neke rûçik    Li wana reş neke kuçik

Tu nefsa xwe bizan kûçik    Bitirse tim ji harbûnê (r. 147)

Mirov ji alîyê xuliqandinê ve çawa ji bo qencîyê minasib e bi heman awayî ji bo xerabîyê jî minasib û xwedî îrade ye. Însan eger ku alîyên xwe yên xerab bi dîn û ilm û edeb terbîye neke dê zerarê bide derdorê xwe. Mela Eladîn balê kişandîye ser vê taybetîya însanan û anîye ziman ku însan eger wê gurê dirinde yê hundirê xwe terbîyet neke dê qîlan bavêje xelqê xwe û mîna rovîyan bikeve pê hîle û lîstikan. Di gelek cihan de Kopî, li hemberê vê tebî‘eta hov a însanî de xwendin, ilm û edebê pêşnîyaz kirîye.

Wekî gur tu navêj qîlan    Wekî rovî neke hîlan

Ji bo fitnê neke pîlan    Nebe yarê belavbûnê

Fena hirçê neke qehrê    Weka marê nerêj jehrê

Di her karî bike sebrê    Tu soza xwe werîn şûnê

Ji Heqqê ra stûxwar be    Li nefsa xwe hukumdar be

Ji bo dînê xwe ra yar be    Bijî azad li gerdûnê (r. 148)

Mela Eladîn, di beytên jêrê de hem hinek terîfa nefsa emmareyê kirîye hem jî bi kurtasî ji bo terbîyeta nefsa emmareyê şîretan nivîsîye. Li gorî terîfa wî nefsa emmareyê her tim hov û har e. Yanê muhtacê terbîye û edebê ye. Ew nefseke wisa ye ku ji bo xwedîyê xwe ne îtaetkar e. Daxwazîya vê nefsê hertim xerabî û hewa û hewes e. Lê ji bo terbîyeta vê nefsê şair van şîretan dike ku lazim e meriv pêşî çavan biparêze ji xerabîyê. Lewra çav derîyê têketina xerabîyan e ji bo nefsê ku ev derî bê parastin nefs jî ji xerabîyan heta asteke tê dûrxistin. Şîreta duyem ew e ku lazim e meriv xwe ji axaftina xerab dûr bike lewra dev eger ji xerabî û heramîyê bê parastin çavkanîya duyem ya xerabîya nefsê jî tê girtin. Her wiha bi parastina çav û devê meriv dikare nefsa emmareyê terbîyet bike. Mela Eladîn digel van herdu ‘uzvan behsa fikrekî kirîye ku ev fikr û bawerî jî gelek car di pêşgirtin û kontrolkirina nefsa xerab de bi fayde bûye. Fikra mirin û fanîbûna jîyanê. Însan dema ku fanîbûna xwe jibîr dike nefsa wî zêdetir har dibe lê fikra mirinê û fenayê wan alîyên har û hov ên nefsê kêtir dike.

Biparêze tu wan çavan    Girêde tu ewan lêvan

Bizane xwe li ha mêvan    Wekî teyrê li hêlûnê

Bizan nefsa xwe hov û har    Dikêşe ew serî berwar

Mutî‘ nabe ji bo serdar    Dixwaze tim xerabûnê (r. 149)

## 4. Şîretên li ser Edaleta Civakî

Edaleta civakî bi nêrîna giştî ew e ku hemû hebûn di nav pergalek de hatine xuliqandin û bi cih kirin hemû mirov jî perçeyên vê pergala mezin in. Çawa ku kaînat bi hev re di nav nîzam û pergalê de her wekî bi alîkarîyek dimeşe mirov jî hem bi hemû pergala alemê re hem jî di navbera xwe de bi alîkarî û piştgirîyê dikare çêtir jîyana xwe berdewam bike. Eger ku însan li gorî van rêzikan bi destê hev bigirin ew pergala ku ji yek îradeyek sidûr kirîye dê jîyaneke xweştir ji bo mirovan pêşkêş bike (Kutup, 1982: 36-37). Şîretên di derbarê dad û edaleta civakî de di edebîyata klasîk de pir zêde nîne. Belkî bi şerh û meneyên kûr meriv bikare gelek gencîne ji beytên şairên berê derxe lê zahiren piranîya helbestan li ser evîn û hezkirinê û li ser mijarên ‘irfanî hatine nivîsîn.

Mela Eladînê Kopî her çi qas ku di terza klasîk de helbest nivîsîbe jî ew şairek dewra modern e. Wî li gorî helbestvanên din zêdetir behsa edaleta civakî kirîye û ev ferqa navbera wî û şairên klasîk yên dewrên berê ye. Ji xwe hijmar û cureyên mezmûnan li gorî sedsalên ku helbest lê hatine nivîsîn diguherin. Mezmûnên ku ji alîyê şairan ve têne bikaranîn li gorî sedsalên cuda kêm yan zêdetir dibin. Xuya ye ku mijarên milletperwerî û edaleta civakî jî di sedsala me de li gorî dewrên berê zêdetir bûye mijara helbestan. Di beytên jêrê de Mela Eladînê Kopî ji bo her kesekî dewlemend wekî wezîfeyek civakî vê şîretê dike ku lazim e bi destê feqîran

bigire û her dem malê xwe ji bo alîkarîya bêçaran xerc bike. Di vir de divê ku meriv balê bikêşe ser ku ev wezîfeya civakî ji bo saz kirina edaleta civakî pir muhim e ku di zemanekî sînordar de pêk neyê, xêr û xêrat lazim e ku her zeman bê navber pêk werin ku xizan bêçar û bê xwedî nemînin.

Kopî dîsa di derbarê heman mijarê de li me şîret dike ku em birçîyan têr bikin û hê ku di destê me de derfeta jîyanê heye heta ku em bikarin di hemû qadên heyatê û di her new'ê hewcehîyan de xêran bikin. Mela Eladîn ji bo têr kirin û mêvan kirina rêwîyan û alîkarîya ketîyan jî şîretan kirîye ku şîreteke wî ya balkêş jî ew e ku xêr û xêrat ne bi tenê bi mal e belkî şadkirina dilek şkestî, ji gelek xêrên maddî çêtir e qenctir e. Mela Eladîn gotîye ku "Ew reng ji hevdu hez kin Hevdu bi ga û pez kin", di vir de gotina ga û pez ji xeyrê alîkarîyê encama alîkarîyê jî nîşan dide. Yanê eger ku millet ji bo ketî û hewcedarên xwe alîkarîyên rast û durust bike ji bo sazkirina edaleta civakî, di wê civakê de hem edalet saz dibe hem jî refaha wê memleketê bilindtir dibe. Bi kurtasî bi tenê di gundekî de jî be eger ku xelq xêrxwazê hev be hesûdîyê ji dil derxe û alîkarîyê di hemû şertan de bide hev dê hijmara ga û pezên her kesekî yanê mal û milkê piranîya gundîyan dê zêdetir be û jiyana gundîyan mureffeh be. Lê ew illetên ku pêşî li milletbûnê digire eger ku peyda bibin û zêde bibin wê çaxê mal û refah bi hêrsa dizîn û hesûdîyê kêmtir dibe.

Zengîn bi dest xizanê — Bigre her zemanê
Mirovê birçî têr ke — Heta bikare xêr ke
Li wana, hem li sêwî — Hilîne xanî rêwî
Kesên ketî ne rake — Dilê şkestî şa ke
Ew reng ji hevdu hez kin — Hevdu bi ga û pez kin
Ji bo hevdu bin fanûs — Nebin wampîr û kabûs
Ji bo sûda civatê — Bike kar û xebatê (r. 33-34)

Mela Eladîn, di beytên jêrê de alîkarîya mirovan û bi vê alîkarîyê ve sazkirina edaleta civakî dîsa bi meqsedek îlahî ve girê daye. Li gorî wî belê lazim e ku meriv alîkarîya feqîran bike, birçîyan têr bike, bê malan xwedî mal bike lê ev alîkarî her çi qas li zahirê û li ser jiyana civakî tesîrên berbiçav û erênî bikin, bi heman dereceyê ev alîkarîyên ku têne kirin li bal Xweda bi qîmet e û şeytên jî aciz dike.

Derî ger tu li bênanan — Venekî hilnedî bin ban
Piçek xwarin nedî ber wan — Çi sûd heye di pirbûnê
Kesê birçî divê têr kî — Hilînî xanî lê xêr kî
Dilê Îblîs bi wî kêr kî — Bila xemgîn demek rûnê (r.148-149)

## 5. Şîretên ji bo Şexsîyeta Maqûl

Mijara şexsîyeta maqûl ji hêlek ve bi mijara adabê muaşeretê re têkildar e. Bi exlaq û edebê re têkildar e ku li civatên misilman bingeha edebê ji sunnetên pêxember sxl. hatîye wergirtin. Rûniştin, rabûn, xwarin, xwendin, axaftin û bi sedan muameleyên nav civatê ji hal û tevgerên pêxember sxl. mînak hatîye wergirtin û civatên misilman van qaîdeyan di çanda xwe de xurttir û geştir kirine (Îsbehânî,2014). Di derbarê edebê de arifê navdar Îbn Mubarek (736-797) wiha gotîye: "Hinek ji edebê ji pirê ilmê çêtir e." (Tûsî, 2012: 164). Mela Eladînê Kopî di cihên cuda yên Dîwana xwe de di nav mijarên cur bi cur de behsa şexsîyeta qenc ya mirovan dike û bi hin şîretan ve dixwaze ku vê şexsîyeta qenc derxe holê. Mesela di beytên jêrê de Mela Eladîn li xwendevanan şîret dike ku lazim e di derûnîya xwe û tevgerên xwe de xwedî muwazene bin, ji îfrat û tefrîtê xwe biparêzin. Her wiha dîbêje ne qûre û xwefiroş be ne jî merivekî ku tu kes jê xêr nabîne û bê doz û bê meqsed dijî be. Di tundîyê de bê eyar nebe lê ji bo rûdanên civakî û xebatan mîna bê minnet û bê eleqe nemîne. Xwedayê xwe ji bîr neke û wekî bêîmanan tevnegere mîna mihê ku şîrê dide ji bo derdorê xwe ji bo milletê xwe bi sûd û fayde be. Her weqt ji bo şexsîyetek pak bi bawerîya Îslamê dilê xwe û jîyana xwe pak bike.

Ne xwefiroş, qilozpoz — Ne jî bêxêr û bêdoz
Ne şêrmîsal bi şîddet — Ne wek psîk bêminnet
Wekî mihê bişîr be — Xwedayê xwe di bîr be
Wek dara meywedar be — Bi sûd û faydedar be

Bi bawer û îman be Paqij û pakjiyan be (r. 34)

Mela Eladînê Kopî ji bo xwendevanan şexsîyeta maqûl û qenc li gorî rêk û pêkên Îslamê terîf kirîye û anîye ziman ku kesekî qenc û maqûl lazim e hemû misilmanan wekî uzvên bedenek bizane û li ku derê vê bedenê biêşe lazim e ku ew mirovê qenc jî bi êşa wî uzvî yanê bi êşa wî birayê xwe biêşe û bilorîne.

Misulman gişt wekî canek Dijîn pêkva di bin banek

Yekê peyda be lê janek Divê jê ra bilorînî

Îmandar in wekî darek Ji wî her şaxekî zarek

Ji bo her yek heye karek Divêtin kar werin şûnê (r. 147)

Di helbestên Mela Eladîn de şexsê qenc ew e ku bi îman e û ji bo civata xwe ji bo milletê xwe bi fayde ye. Ew kesê ku wekî amûrek bikêrhatî be yanê çawa ku sabûn kef bike destê meriv paqij dike û bikêrhatî tê qebûl kirin. Lê belê sabûna ku kef neke bêkêr tê qebûl kirin. Mirov jî eger ku ji milletê xwe re bi sûd be kar û xebatên wî di encamê de ji bo xelqê wî fayde bîne ew meriv maqûl û qenc e.

Wekî sabûnê tim kef de Nebe bêkêr û serhevde

Tu qencîyan li ber hev de Bikêşe gel bi şabûnê

Tu paqij be fena şîr be Di karê rindîyê jîr be

Ne xafil be Xwedê bîr be Li rabûn û li rêçûnê (r.147)

Kopî di helbestên xwe de ji bo ku şîretên wî zêdetir tesîrê bikin carinan bi uslûbek bi tehdît jî hişyarî dike. Li gorî hişyarîya wî eger ku meriv dev ji xerabîyê bernede û hertim li pey xerabîyê xelqê xwe cîranê xwe û derdorê xwe be teqez dê di vê rêya xerabîyê de xerabîyên mezintir were serê meriv. Lewra şair beyan kirîye ku eger ehlê xerabîyê fena mişkê herdem dîwarê xelqê bikole ew dîwar di dawîyê de dê li ser stûyê wî bikeve.

Dîwarê xanîyê xelqê Nekole tu wekî mişkê

Li te rokê stû dişkê Tu ranabî ji wê şûnê (r. 148)

## 6. Şîretên ji bo Xwendin û ‘Ilmê

Dînê Îslamê bi fermana ewilîn a Qur’anê ji bawermendan dixwaze ku bixwînin. Bi navê Xweda û ji bo rizayê Xweda bixwînin. Yekî ji arifên navdar Ebû Silêmanê Daranî (mr. 830) di derbarê ilmê de dibêje ku eger ez bizanim li Mekkeyê kesekî heye ku di derbarê ilmê merîfetê de dê tiştekî bi fayde ji min re bibêje ez ê bi peyatî hezar ferseh rê biçim û wî guhdarî bikim (Tûsî:2012:205). Mela Eladînê Kopî di helbestên xwe de di nav gelek mijarên cuda de li ser xwendin û ‘ilmê şîretan nîvîsîye. Li gorî terîfa wî benda herî xerab a li ber pêyê civata Kurdan nexwendin û nezanî ye. Kopî şîret dike ku bi taybetî zarokên ku li sûkan bê xwendin û sen‘et mezin dibin lazim e ku bêne kom kirin û di sazîyên xwendin û ‘ilmê de cih bigirin. Lê li vir lazim e ku du xal bêne îzah kirin ku Kopî xwendinê bi du şaxan terîf kirîye. Yekî xwendina ilmên dînî û yê din xwendina ‘ilmên fenî ye ku şair ‘ilmên dînî dişibîne nûrê û ‘ilmên fenî jî dişibîne zîyayê. Xala duyem jî ew e ku şair, meqseda xwendina her du ‘ilman û meqseda xelasîya ji cehaletê bi merîfetullahê terîf dike ku li gorî wî meqseda eslî ya xwendinê nasîna xwe û nasîna Rebbê xwe ye. Lewra di nêrîna Mela Eladînê Kopî de bi tenê kesekî ku xwe û Rebbê xwe nas bike dikare ji xelqê xwe re bi fayde be. Lewra merîfet ne zanîneke teorîk e, li gorî ferhengên tesewwufî merîfet agahîyeke tecrubî ye û nas kirin yan jî aşnabûyîn jî bi agahîyên teorîk çênabe (Uludağ,2012:236).

Divê em pir bixwînin Tehsîla jor bibînin

Ulûmê dîn û sen‘et Ulûmê fennê musbet

Bibin ronek û zana Bibin pispor û bîna

Evîna xelk û dînê Bikin esasê jînê

Ji bo fayda civatê Rizgarîya welatê

Bikin kar û xebatê Heta roja beratê

Bişon ji rû vê xakê Hemî çewtî nepakê

Wekî dizî bêdadî Wekî kîn û fesadî

Wekî derew bêbextî Eza û zulm û zextî
Li xelkê av birandin Li sêwî cil dirandin
Şerab û mey vexwarin Ku vana tev gemar in
Cehalet û nexwendin Ji bo pîyên me bend in
Divê ku em biçûkan Berhev bikin ji sûkan
Bidin xwendin ewan gişt Dibin ji bo me ra pişt
Çiku kesên nexwînin Nezan û hov û dimînin
Ulûmê dînî nûr in Ji bo dil ra hizûr in
Ulûmê fen zîya ne Bi bona hiş ziya ne
Pêwîste em bixwînin Ku rastîyê bibînin
Xwe û Rebbê xwe nas kin Hingî xwedî du bask in
Kesên Xweda nebawer Merov bi wan ne bawer (r. 47-48)

**ENCAM**

Di encama vê vekolînê de ji berhema Mela Eladînê Kopî yanê ji Dîwan-Rezê Jîyanê bi tevahî 162 beyt hatine tehlîl kirin. Di derbarê mijara şîretên ji bo milletperwerîyê de bi tevahî 41 beyt hat analîz kirin ku dema meriv bala xwe bide vê berhemê xuya dibe ku giranîya şîretan li ser mijara milletperwerîyê ye. Helbet Mela Eladîn li gorî şiroveya xwe milletperwerîyeke ku bi dînê Îslamê re têkildar e şîret kirîye û vê jî bi fikr û nêrîna Se'îdê Nursî bi bingeh kirîye. Giranîya vê mijarê yanê giranîya milletperwerîyê di berhema wî de bi hijmara bêytên vê vekolînê nayê tespît kirin. Lewra di derbarê milletperwerîyê pir zêdetir beyt hebû ku ji ber dubarekirina heman mijarê di vê xebatê de nehate dayîn. Her wiha meriv dikare bibêje ku mijara milletperwerîyê û şîretên li ser milletperwerîya musbet ku ew milletperwerî lazim e ji dînê Îslamê dûr nebe, di piranîya berhema Mela Eladînê Kopî de xwe nîşan daye.

Mijara duyem ku pir zêde di berhema Mela Eladîn de hatîye nivîsîn mijara ehemîyeta Dînê Îslamê ye ku di derbarê vê mijarê de 39 beyt di vê vekolînê de hatine tehlîl kirin. Mela Eladîn di vê mijarê de dîn û rêya dîn wekî armanc û meqseda heqîqî ya cîhanê û heyata dunyayê terîf kirîye û ji bo sûda civat û milletê Kurd dîndartîyekî bi milletperwerîya musbet ra têkildar şîret kirîye. Ji şîretên wî tê fêm kirin ku dîn, rastî, durustî, teqwa û qencîxwazîya milletê divê û jixwe milletperwerîya musbet jî heman tiştan yanê sûd û menfeeta milletê Kurd qenckirina pêşeroja zarokên Kurd divê ku ji vê hêlê ve ev herdu mesele piştgirê hev in û ji hev nayên qetandin.

Di derbarê mijara nefs û aqil de ku ev şîretên balkêş in di berhema Mela Eladîn de bi tevahî 21 beyt hatin tehlîl kirin. Şîretên li ser aqil û nefsê bi rastî çanda 'irfanî ya civat û medreseyên Kurdan jî nîşanê me didin ku jixwe hem mîrasa edebîyata me ya klasîk bi 'îrfan û merîfetê tijî ne hem ji medreseyên Kurdan ji bo tesewwufê qadên pir muhim in.

Di derbarê edaleta civakî de 11 beyt hatine tehlîl kirin lê ji bo mijara edaleta civakî jî lazim e ku bê gotin ku ev mijar di berhema Mela Eladînê Kopî de pir hatîye nivîsîn lê bi mijarên din re hatîye nivîsîn û dîsa ji bo ku tekrara zêde çênebe bi tenê 11 beytên nimûne hatine tehlîl kirin. Lewra di nav mijarên din de bi taybetî di mijarên milletperwerî, dîn û xwendina ilmê de jî mijarên edaleta civakî kê yan zêde hatîye dayîn. Mijara edaleta civakî yanê alîkarîya civatê bi taybetî alîkarîya feqîran ji bo ku ferqa navbera feqîr û dewlemendan kêmtir bibe bi rastî rêzikek dîn û milletperwerîyê ye. Li vê derê îsbata wê her çi qas mumkun nebe jî meriv dikare bibêje ku di edebîyata klasîk de mijara edaleta civakî mijarek pir berbiçav nîne. Lê helbestvanên terza klasîk ên îroyîn ku bi taybetî ji bo fikra milletperwerîyê zêdetir cih dane mijara edaleta civakî.

Di derbarê mijara şexsîyeta maqûl ku ev mijar ji alîyek ve jî di çarçoveya adabê muaşeret de tê nirxandin 15 beyt hatine tehlîl kirin. Milletê Kurd ku girêdayê çand û edetên xwe yên kevnar e hem di civatê de hem jî di qada perwerdehîya medreseyan de gelek ehemmîyetê daye mijarên edeb û usûlê. Mela Eladînê Kopî jî di berhema xwe de ji bo ku her ferdekî civata Kurd bibe xwedî şexsîyetek qenc û maqûl şîretên balkêş anîye ziman. Mela Eladîn li ser mijara xwendin û ilmê jî gelek sekinîye. Di derbarê vê mijarê de bi tevahî 20 beyt hatine tehlîl kirin. Bi rastî meseleya xwendinê hem bi dîn hem bi milletperwerîyê hem bi sazkirina edaleta

civakî û hem jî bi çêkirina şexsîyetên qenc têkildar e. Lewra li gorî terîfa Mela Eladîn xwendin, bingeha van hemû kar û qencî û xweşîyan e.

**ÇAVKANÎ**

Abdürrezzak Kâşânî. (2015). *Tasavvuf Sözlüğü*. (E. Demirli, Çev.) İstanbul: İz Yayıncılık.
Aykaç, Y. (2020). *Mela 'Eladînê Kopî û Berhema Wî ya "Dîwan-Rezê Jiyanê"*. Anemon, 8, 111-122.
Ebû Nasr Serrâc Tûsî. (2012). *El-Lüma' İslâm Tasavvufu*. (H. K. Yılmaz Çev.) İstanbul: Erkam Yayınları.
Ebu'ş-Şeyh el-İsbehânî. (2014). *Hz. Peygamber'in Edep ve Ahlâkı*. (N. Erdoğan, Çev.) İstanbul: İz Yayıncılık.
Günay, T. (1994). "Din". *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*. C. 9. İstanbul. 312-320.
Kopî, M. E. (2013). *Dîwan Rezê Jîyanê*. Stenbol: Nûbihar.
Kopî, M. E. (2024). Jiyana Pîroz. (H. Ertaş, amd.) Wan: Peywend.
Kutup, S. (1982). *İslâm'da Sosyal Adalet*. (B. Eryarsoy, Çev.) İstanbul: Arslan Yayınları.
Mutlu, Î. (1994). *Bediüzzaman'ın Görüşleri Işığında İslam ve Milliyetçilik*. İstanbul: Mutlu Yayıncılık.
Uludağ. S. (2006). "Nefis". *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*. C. 32. İstanbul. 526-529.
Uludağ. S. (2012). *Tasavvuf Terimleri Sözlüğü*. İstanbul: Kabalcı Yayıncılık.